# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

<u>Xebat ji bo :</u> * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* **Newroz95@hotmail.com**

| Hejmar(66) | Sibat | 2006 z-2617 k | Buha ( 15 ) p.s |
|---|---|---|---|


## Meha Avdarê li ber me ye

Meha Avdarê di jiyana gelê me yê Kurd de, bû ye taybetmendiyeke girîng-buha, ciyê çalakî, rêzgirtin û geşkirina xebatê ye.Heyva bîranîn, cejn û rojên bi nirx û şanşoret, digel êş û derd, xem û hêviyan e.

Bêguman, roja herî berz û balkêş, roja 21ê Avdarê, cejna Newrozê, cejna netewî ya tevahiya gelê Kurd e. Bi ser de, roja 16ê Avdarê, roja bombebarankirina **HELEBÇE** bi çekên kîmawê li sala 1988 an e. Û roja 12ê Avdarê ku, ev e du sal in li ba gelê me yê Kurd li Sûriyê bûye navnîşaneke bi wate, hêjayî rawestin û bîranînê ye. Û ji bîra me neçe ku, roja 8ê Avdarê jî, rojeke bi nirx û li seranserî cîhanê, rojeke çalakiyan bona naskirin, pejirandin û parastina mafên jinan e. Lewre, gava meha Avdarê xwe nêzî me dike û bi ser me de tê, mirov bêtir hişyar dike, da ku, karibe jê re amede be û bi berpirsiyarî, bi rûyekî geş û dilgermî bi erkên xwe rabe.

Di vê çerçewê de, hêjayî gotinê ye ku, pirs û pêdiviyên heyva Avdarê ne tenê yên kesa ye, lê belê, ustibariya tevgera siyasî, rewşenbîrî û civakî ye û nemaze ya rêxistin û komîteyên partiyên tevgera Kurd bi tevahî û ya Hevbendiyê, digel Eniya demoqrat e. Xelkê me yê Kurd li Sûriyê, her diçe bêtir li pirsa xwe ya netewî a demoqratîk xwedî derdikeve , lewre jî berê xwe daye tevgera xwe, bi hêviya ku, ev meha pîroz bi xêr û xweşî be, bi hêla aştî, azadî û wekheviyê ve biçe.

***Sînorê Yekta***

## Kurd û "Belgeya Îlan Dîmeşq"

Berî hertiştî , çima tevgera kurd li Sûriyê ciyê xwe di vê belgeyê de , dît ? . Ji ber ku jerkî qedera gelê kurd bi xaka xwe ve , piştî peymana Saykis Bîko bi Sûriyê ve hate girêdan . Bi taybetî jî li dû serxwebûna Sûriyê ji bin nîrê firansa û avakirina dewletê; çiqas rijîm û hikûmet di ser wê re derbasbûne , ji sala 1946 an ve bigir û ta roja îro , tucar wek gelê diwem piştî gelê Ereb em nepejirandine û ne jî wek mirov bi me re dane û standine . Lê belê bervajî wê , wan tim û tim gelê kurd û tevgera wê înkarkirine , dijîtî û siyasetek şoven û nemirovane di dermafê wê de ajotine , em di civaka Sûriyê de weke hov û cûdaxwaz **D.R (11)**

www.arsivakurdi.org

# Hevpeyvîn bi mamoste Hemîdê Hecî Derwêş re

## Sekreterê partiya demokrat a pêşverû ya kurd li Sûriyê



Mamoste Hemîd, em kêfxweş in bi navê weşana Newroz, vê dîtinê bi we re bikin, li we guhdariyê bikin, nerîn û bîrbaweriyên we di ezmûna xebata bêtir ji 50 salî di ber doza gelê kurd de, biguhêzin xwendevanên Newrozê. Gelekî bi xêr hatî..

**1**- Di wan rojên berê de ku asteya hesta netewî li ba gelê me ji ber sedemên tunebûna xwendin û zanînê, merc û hoyên eşîrtî, malbatî û hwd... qels bû, şêweya kar û xebata we hingî çawa bû?.

*Dsetpêka derbasbûna min di tevgera siyasî de, rewş gelekî tevlîhev bû, hestê netewî kurdî gelekî sivik bû û kesên di vî warî de kar dikirin hindik bûn.Tenê, hestê olperestî û êlperstiyê cihê xwe di nav gel de girtibû. piştî me partiya demokrat a kurd li Sûriyê damezirand, gelek kelem û asteng li pêş me derketin, nemaze di warê diraviyê de û şerê olperstan û partiya komonist ji parta me ya nû re. Lê, ji ber girêdana me, bi doza me ya netewî ve û israra me, me karîbû em şopa xwe vekin.Di vir de, ez ji dîrokê re dibêjim ku hevalê rehmetî* ***Osman Sebrî*** *di pêşiya me hemiyan de bû.*

**2**- Piştî van guhertinên ku li seranserê cîhanê rû dane, mîna pêşketina bê sînor a dezgehên ragihandinê, geşbûna xebata gelên cîhanê ji bo parastina mafên mirovan, şerê cîhanê dij terorê, û rûxandina rijêma Sedam li Iraqê, û ya Taliban li Afganistanê... Hûn paşeroja gelê kurd bi gelemperî, û gelê me yê kurd li Sûriyê bi taybetî çawa dibînin?.

*Bêgumane ku gelê me yê kurd, di siha rijêmine diktator, nijadprest û hov de, ewên hewil dane wî tune bikin, qonaxine perîşan û dilêş derbas kirine, bi hezaran qurban û cangorî pêşkêş kirine, bextiyariya xwe winda kiriye. Lê, îro em di qonax û demeke nû de dijîn, nîşan û sembola wê demokrasî û parastina mafên mirovan e. Ev yek, mizgîniya qonaxeke nuh dide me ku gelê me dê xewnên xwe di azadî û bidestxistina mafên xwe yêm netewî û rewa de bibîne. Lê, divê em zanibin çawa sûd û mifayê ji vê qonaxê wergirin. lewre divê em siyaseteke zanistî, demnas û realist bikar bînin, ji dilxwestin û ewatifan bidûr Kevin.*

**3**- Welatê me Sûriyê, li ber dergehê guhertina ye, gelo rewşa tevgera me ya kurdî ya îro, dikare rêbertiya qonaxa bê bike? Û eger na be, hûn çi xebatê di ber yekirina vê tevgerê de dikin?.

*Belê raste ku welatê me Sûriyê li ber dergehê guhertinin nuh e, û raste tevgera kurdî ne weke em dixwazin bi hêz û hevgirtî ye, wilo jî tevgera netewî ya Sûrî bi tevayî, lê ez dibînim û bi bawerîke mezin dibêjim ku tevgera me ya kurdî dikare li kêleka tevgera netewî ya Sûrî bi rola xwe rabe û pêşkêşiya wan guhertinan bike. Divê em bizanin* D.R (3)

www.arsivakurdi.org

Dumahîk : ***H evpeyvîn...***

*û weke ezmûnên gelên dinyayê û gelê me em hîn kirine, tiştek hazir û bê kêmasî tune ye. Jiyan, dibstan e, mirov fêr dike çawa bûyeran bişopîne û çawa pêşkêşiya wan bike.*

**4-** Gelo sedemên berberî û devavêtinên ne di rê de ku car bi car di navbera rêxistinên me de serî hildidin çi ne? û çima emê ne bi biratî û hevaltî di çarçewa mafên nêrîn û derberînê û rêzgirtina baweriyên hev de li ser yek maseyê rû li rû, bi rengekî modern rexneyan li hev negirin?.

*Sedemên nakokiyan di navbera hêz û partiyên kurdî de gelek in, min di pirtûka xwe de(Ronahî li ser tevgera kurdî li Sûriyê) hin ji wan sedeman dane xuyakirin, hêvî dikim li min bibûrin ku ez niha wan dubare nekim, lê, bi her hawî, ez durust nabînim ku ew newekhevî di nerên û bîrbaweriyan de rengekî dijminatiyê wergirin weke berê dihate kirin û mixabin weke îro jî hin hewil didin bikin.Dibe ku em di hin pirsên siyasî de ne yeksa bin, lê, şerm û kirête ku ev cudahiya nerînan bibe egera dijminatiyê û rêzgirtina hev winda bikin. Ji hêla xwe ve, ez bangî hemî welatparêzên dilsoz dikim ku dengê xwe bilind bikin, şerê vê helwestê bikin, ji ber ku ev dijayetî, xwesteka dijminane, tenê dijminên me, pêk tîne, û min gelek jan ji ber vî derdî kişandiye.*

**5-** Ma gelo ev hişkbaweriya milî ya ko li nik partiya Bes û hin kesayetiyên Ereb heye, xizmeta Sûriyê dike?

*Ev siyaseta netewiya teng a nijadperest ku ji bal partiya B,es û hin hêzên Erebî li Sûriyê ve tête ajotin, ne tenê xizmeta Sûriyê nake, lê ew hevgirtina netewî jî kûr birîndar dike, dibe egera şûndemayîna welatê me di hemî warên jiyanê de.Tu kes nikare bibêje ku nerîna netewiya teng rojekê ji rojan li welatekî bûye sedemê pêşketin û avakirinê, ev yeka han jî, li bejin û bala parta B,es tê û xwe lê dixwe.*

**6-** Weke kesayetiyeke xwedî ezmûneke direj di xebata kurdewariyê de, hûn çawa li têkiliyên kurd û ereb û kêmnetewyên din ên Sûriyê dinerin û hûn dixwazin ew têkilî bi çi rengî bin?.

*Têkiliyên di navbera tevgera Kurdî û ya Erebî di vê qonaxê de her çend ne di asta em dixwazin de ne jî, lê ew ne xirab in, em hêvîdar in ku pêşve herin da têkeve rajeya welatê me Sûriyê û rajeya gelê Kurd û Ereb. Divê bête zanîn ku, bê wan têkiliyên durust, problêm û pirsgirêkên Sûriyê tucarî çareseriyê nabînin. Ji me hemiyan tê xwestin, ango xebatker û têkoşerên kurd ku têkiliyan bi tekoşerên Ereb re geş bikin, da em hemî bi hev re welatê xwe ava û xweş bikin.*

**7-** Di vê qonaxa nazik de ya ku gelê me tê re derbas dibe, pêwistî bi avakirina encumeneke kurdî tune ye, ku hemî partiyên kurdî û hin kesayetiyên xweser tê de cih bigrin û ew bibe jêdera biryara kurdî li Sûriyê?.

*Ez dibînim çêkirina encumeneke kurdî di bin çi navî de be, tiştekî gelek pêwist, giring û hêja ye, ji ber ku ev encumen dê roleke aktîv di xebat û yekirina gelê me de bilîze û dê xwestek û vîna gelê me yê kurd li nik yên mafên wî didine mandelê bich bîne.*

***D.R (4)***

www.arsivakurd.org

Dumahîk *:H evpeyvîn...*

**8-** Hûn qedexekirina zimanê kurdî çawa dinirxînin, û rola zimanê me yê zikmakî di geşkirina xebata netewî ya nûjen û aştiyane de çawa dibînin?.

*Bêgumane, qedexekirina zimanê kurdî û ne xwendina wî di dibistanan de, guneh û tewanekî mezine li gora lîsta mafê mirovan. Lê, ez dixwazim tiştekî bibêjim, ew jî ew e ku, em di serî de ez bi xurtî xwe rexne bikim, ji ber em weke dihate xwestin jê re ne xebitîn û em vê sersariya xwe nexin stuyê kesên ku çand , folklor û zimanê me li me qedexe kirine. Li vir, ez destên we digrim û bi dilgermî diguvêşim, daxwazê li we dikim ku hûn bi xurtî di vê rê de bixebitin, tevî ez baş dizanim bê çiqas rêl û kelem di riya we de hene.*

**9-** Di dema îro de, partiya we çi karî di ber ziman û kultura kurdî de dike?.

*Weke min got, ez xwe û partiya xwe jî ya ku ez pêşkêşiya wê dikim weke sekreter rexne dikim , ji ber ne guhdana pêwist ji zimanê kurdî re.*

**10-** Eve 64 hejmar ji weşana Newrozê ya du mehane bi temenê 10 salan têne weşandin, hûn çi ji xwendevan û komîta wê re dibêjin, çi rexneyên we lê hene?.

*Dûrî dilxweşkirinê, keyfa min gelekî ji vîn û israra we re tê ku hun weşana NEWROZ çap dikin û li kurdan belav dikin, ez jê re pêşketinê dixwazim, hêvîdar im ku xwestekên we bi cih werin da ku weşana Newroz bibe weşaneke aşkere û legal, bi serbestî keç û lawên gelê me wê bixwînin.*

**11-** Ji bo guhdana xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî, hûn çi ji keç û lawên gelê me re dibêjin?.

*Tiştê ez dixwazim ji keç û lawên gelê xwe re bibêjim, da ku ew hînî zimanê dayika xwe bibin, ezê gotina hevalê hêja, rêzanê mezin (NÛREDÎN ZAZA) ya ku sala 1956 an gotibû, dubare bikim:*

*( Gelî kurdan!.. Eger hun dixwazin xwe nas bikin û xwe bi xelkê bidin naskirin, ger hun dixwazin xizmeta gelê xwe bikin, zimanê xwe bixwînin û wî bidin xwendin...)*

*Li dawiyê, qedirnasî û hezkirina min ji we re birayên xoşewist di komîta NEWROZ ya ezîz de. Serbilind û bi rêz bijîn.*

**sipas mamoste, bimînî di xweşiyê de.**

**Qamişlo 15-02-2006 z**

********************************

# Şevek evînî

***Di** roja sêşemê 14\2\2006 an de , Komela Ciwanên Kurd li sûriyê, şahiyek bi boneya Cejna Evînê, bi beşdariya 45 ciwanan û mamosteyên hêja li dar xist. Û bi van çalakiyan şeva xwe derbaskirin :*

**1-** Axaftin li ser pêwîstiya evînê di jiyana mirov de û bi taybetî di jiyana ciwanên kurd de û çawa ewê bi vê hestê re bidin û bistînin .

**2-** Mûzîkek kurdî xweş û rengîn .

**3-** Çend dirûşmên balkêş hebûn mîna **Zanîn , Ziman , Evîn bi wan civakê birengîn .**

- **Qamişlo , Kobanî , Efrîn di nav wan de biçîne evîn .**
- **Xwendin , pêşketin û evîn armancên me yên yekemîn e .**

**4- Pêşbirk û diyarî ji ciwanên beşdar**

**Şandevanê N.W**

Em - komîta Newrozê - Komela Ciwanên Kurd Li Sûriyê ji bo van çalakiyên hêja û binirx sipas dikin.

www.arsivakurdi.org

# Divê em li hebûna xwe xwedî derkevin

D. Dilpîr

Piştî guhertinên nû li seranserî cihanê û bi taybetî di van deh- panzdeh salan de, pêşesazî bi gavine mezin bi pêşve diçe , tiknolociya di hemî waran de, bi berferehî, nemaze di hêla alav û dezgehê têkel û ragihandinê de dimeşin.

Îro-roj, kompiyûter bûye serdarê demê. Loma jî, cîhan weke gundekî biçûk lê hatiye. Mirov û miletan ev yeka ha ji bo hebûna xwe tewandin û berjewendiya civaka xwe pê diparêzin û pêşdixin , ziman, çand û koltûra xwe di nûjeniyê de diçespênin.

Vêca, em kurd ji vê şoreşa zanistî û tiknolociyê ka li kû ne?. Tevî ku, em ji her kesî bêtir pêdiviyê vê yekê ne . Lê, mixabin ta niha, sazî û alavên ku, bı zimanê kurdî dixebitin, hê di bin bandora ezîtiya partîtiyê de ne, bi taybetî Radyo û T.V yên ku bi berferehî bandorê dikin. Ji vê yekê, ez banga xwe didime rêvebirê van alav, û saziyan ku, wan bixin ber rajeya kurdayetiyê , bo parastina ziman û çanda kurdî . Erk û ustubarê niştimanî yê her kurdekî ye, ku li van saziyan miqatebe bêtir ji yên ku, ne bi zimanê me ne.

Lê mixabibin tu di malan de dibînî, ku guhdan li CD û kenalê bê sûd bihtir e, dengê strana -Yar Mêremê- yan jî Xwazgînîkê min hatine lê yadê. Ev jî tê kirin bi sedema serdemî û têgiştina zaravê T.V yên kurdî. Tevî ku me dît berî kenalên kurdî ronahiyê bibînin. Gelek keç û lawên ji ber temaşekirina kenalên Tirkî, hînî zimanê Tirkî dibûn û zimanê kurdî ji bîr dikirin. Ji vê yekê ez dibêjim divê hebûna me li ba me ji halo bêtir be .

# Ebdula Pêşew

Hemreş Aştî

Helbestvanê vejîndar û dilsoz yê ku, bi zaravê soranî ristên xwe afirandine, bi tiliyên xwe yên zêrîn û ramanên geş wek kaniyeke ava zelal û paqij bide, di ezmanê rist û tora kurdî de bû stêreke evîndar.

Ebdula Pêşew, di sala /1947/ an de, li hêla bajarê /Hewlêrê/, li gundê /Bêrokê/ hate jînê. Di du saliya temenê wî de, bavê wî sala 1949 an koçbar kir, ji dêkê re ya ku, karê malê tev ketibû ser milên wê sêwî mabû.

Tirh, lemên hest, huner û torevaniyê, di dil û giyanê Ebdula Pêşew de kat dan, evîndariya welêt, têgihiştina perwerda vejîndariyê bûne mûmek û zindana jiyanê, jê re ronî kirin. Çimkî, di temenê/14/ salî de, wî dest bi nivîsandin û vehûnana rist û helbestên kurdî kiribû. Helbestên wî, di gelek rojname û kovaran de hatibûn weşandin .

Ebdula Pêşew bi zaravê soranî, helbestên xwe dihûnandin û hin helbestên wî bi zimanê Erebî jî dihatin weşandin. Dîwanên wî yên ku em dizanin hatine çapkirin /3 /ê ne. Dîwana yekem di sala /1976/ an de bi navê /BİRİN/ hatiye çapkirin. Pişt re ,di sala /1978/an de, pirtûkeke din, ji aliyê wî ve hatiye çapkirin , pêşgotina wê mamoste Marûf Xeznedar bi gotinine hêja ristine.

Ebdula Pêşew, ji sala/1973/an ve, li yekîtiya sovyêt dijî. Li wir, ew bû endamê yekîtiya nivîskarên kurd û helbestên Boşkîn Lêrmantof, Feda Yasînın û Meksîm Gorkî werdigirîne zimanê kurdî.

www.arsivakurdi.org

*Tenduristî* *Tenduristî* *Tenduristî*

## Sêndroma Kirasbir
## Li Ba Jinan

**Bijîjkê Newrozê**

Mîna ku nas e, kirashatin nîşana kamilbûna keçika ye. Ew di dehsaliya diduyê ji temenê keçikan de dibe. Kirashatin her çar heftan carekê tê û ji sê ra heft rojan dirêj dike.

Kirashatin di navbera 40 û 55 saliya temenê jinan de tê birîn û dawî li zarokanîna tê.

**Kengî Kirasbirîn mêlag dibe?**

Kirasbirîn mêlag dibe, gava kirasê jinan dozdeh mehan li dû hev netê. Wê hingê hinek pirsgirêkên tendurustî li ba jinan peyda dibin, bi wan pirsgirêk û rûdawan re ((Sîndroma Kirasbirîn)) S.K. tê gotin.

Lê di salên berî ku S.K mêlag were de, hin pirsgirêkên tendurustî li ba pîrekê çê dibin. Ew bi (( sîndroma berî kirasbirînê)) SBK bi nav dibe.

Di dema kirashatinê de, pileyên hormonên Estrogcên û Procêstron di xwînê de di hevpîvanek rawestayî de dimînin. Lê di dema SBK de ew hevpîvan dişkê, lewre jî pirsgirêk û rûdawên tendurustî yên ne normal çê dibin, gelek jin ji ber digazin û serdana bijîşkan dikin. Ew rûdaw jî ev in:

- ji nişkave hilma germ laşê jinan digre, xuhdan dide, carina taya sar jî têyê, ev rûdaw bêtir bi şev çê dibe, û ji çend sanî ta katjimêrekê dirêj dike.
- Xulqteng dibe, pêlên diltengî û dilferehiyê dûverêz dibin û jinan dêşînin.
- Li ba hin jinan jibîrkrina navan, tiştan peyda dibe û nikanin wînin bîra xwe.
- Jin bi nevehesiyê hestewar dibe, lewre westan, xulqtengî peyda dibe û xewrevînî çê dibe.
- Gava bi mêrê xwe re radize êşek peyda dibe.
- Dilopên mîzê jê diherikin, nemaze gava jin qelew be.
- Hin guhertinên ne baş di çerm û por de çê dibin.

**Çawa SBK tê çereserkirin?**

- Werziş zor giring e di vê pêngavê de.
- Di vê pêngavê têgihîştina heval û hogirên derdora jinê zor sûdar e. gereke jin bi xwe jî sedemên pirsgirêkên SBK baş nas bike û jê netirse.
- Bijîkê dê hin hurmon û dermanan bide, ew jî dê gelek sûdar bin.

Li dawiyê gava pîrek bi wan rûdawan hestewar bibe, gerek li bijîşkê xwe vegere û bi şêwra wî bike.

---

# Fehîm Şêxo hate girtin

**Fehîm Şêxo Kurdekî ji gundê Efrîtê, -Dibasiyê- ye. Ji sala 2000î ve li Almaniya dijî Lê, mixabin destlata Almaniya wê di 16/2/2006 an vedgerînin Sûriyê, li firokxana Şamê, ji hêla hêzên paristinî ve tê girtin.**

**Em bi navê Komît û xwendevanên weşana Newrzê , vî karî şermezar dikin û daxwaza serbestiya wî dikin.**

www.arsivakurdi.org

# Jina Kurd di warê hunerî de

**Dîlan Zivngî**

Miltên di warê hunerî de , zengîn û dewlemend bi balkêşî rola xwe di pêvajok û şaristaniya dîroka mirovane de nîşan didin . Miletê kurd jî , yek ji miletên di vê warî de dewlemend û zengîn e ligel ku , ji sedê salan ve bindest û dapeşkirî ye ,li encama wê yekê , ji hêla dijmin û neyaran ve, têra xwe tore û hunera kurdî hatiye dizîn û bincil kirine. Lê di sira jin û mêrên gelê me yê Kurd e û nemaze jina kurd ji zû ve, li hunera gelê xwe xwedî derketiye û ew ji windabûnê parastine . Ma kî nizane ku , jina kurd di warê paristina hunerê de xwedî roleke mezin e ; dema mêr û xortên kurd diçûn şer û cengan, jinan li ber darê dergûşê, bi dengên xwe yên xweş û zîz stran û lorîn digotin . Di warê evîn , serpêhatiyên civakî , dewat û Şahiyan de jî ,pir stran , hevalok Û h.w.d digotin . Ev yeka di çêrok û stranên kevnar de baş diyar e, hunermendê hêja Şivan perwer di stranên xwe de tîne ziman û weha distrê: ..Delorî lorî kurê min lorî .. Bavê te kuştin dayîk bigorî .. Ji roja - roj ve, jina kurd sergovend e .

Lê çi qas mixabin , hino -hino jin ji jiyana hunerî bi dûr xistin û rola wê bincil kirin !

Di roja me îro de , kurdên me li seranserî çarperçeyên kurdistanê , bi şahinazî di warê hunerî de li pêş xelikê cîhanê , rola xwe di pêvajoka şaristaniya cîhanê de nîşan didin . Bêguman pir cure û şaxên huneran hene wek : stran , mizîk , şano , reqis û sema , çêrok , wêje wênekêş û h.w.d . Vêca jî , eger em bixwezin bi gelemperî li ser hunera kurdî rawestin , pir şev û roj jê re divên, wisan jî merem û dilxweziya me ew e ku , bi kurtebirîn li ser rewşa jina kurd di warê stranan de, nemaze jina kurd li perçê sûriyê ji kurdistanê rawestin.

Weke xuyaye , gelê kurd di rojhilata navîn de bêtirî miletên dî , di bin



bandora ola Îslamî û sîstema bavan de, mafên jinan , di hin cure û şaxên hunerê de bincil û qedexe kirine !.

Pir asteng û kelem , di riya wê de , çandine. Lê tevî wê yekê jî , ji zû ve, li sê perçên Kurdistan tirkiyê , Êraq , Îran kêm zê de, navên jinên dengbêj , di dîroka hunerî de diyar û aşkere bûne, nimûne : Merym- xan , Eyşeşan , Gulbhar û H.W.D , di roja me îro de jî , bi dehan jinên degbêj hene weke : **D.R( 9 )**

www.arsivakurdi.org

**Dumahîk : Jina Kurd ....**

Gulistan perwer , Besê , ŞerÎbana kurdî, Fatê û h.w.d . Lê zor mixabin, li perçê sûriya me ya Sêrîn û biha , navên jinên dengbêj di dîroka hunerî ya nêzîk de nînin !.
Belkî , bi ya min be û xuyaye ku , kurdên me li vê şûriyê , di vê warî de, bêtirî deverine dî, bi şûnketîne û li şûnin . Ew gerdîşên civakÎ yên pûç , kufikî û vala, li ser hiş û ramanê me roj nedîtan ( Kurdên Sûriyê) pal vedane Nêrînek çewit û nizim , li jina hunermend dimeyzînin , loman jî , keç û jinên xwe ji jiyana stran û stranbêjan bi dûr dixin .Bêguman ev yeka, encama nezanî û nasnekirina nirxê hunerane .

Belê û tenê, li ev çend salên dawîn , tek- tûk keçên ciwan , di riya komikên reqis û seman de, di riya hin partiyan re, ew dîsan dibêjim tek -tûk tênê dîtin. Mixabin û pir - pir mixabin şêweyên têkiliyan bi wan re ne , ne bi kêrhatî û li gora daxwez û demê ne, pir pirgirêk û serêşên gelekî dijwar, ji hêla malbat û civakê ve , ew dengên nûgiha dibînin .

Zor - zor girînge ku basikên tevgera me ya siyasî , nirxê huner û hunermendan nemaze jin û keçên hunermend(stranbêj) di nava civakê de li wan xwedÎ . Pir pêwîste ku , em di vir de bi bîr bîninû xuyan bikin ku, huner bingeha dîrok, ziman û çanda miletan e . li dawÎ serkefitin û duhatiyeke xweş û geş , ji keç û jinên hunermend re li seranserÎ çar perçeyên Kurdistan , pêşketin û bi destxistina mafên hunerî , ji jina kurd li Sûriyê re hêvîdikin.

# Yekîtiya Avokatên Kurd

Avokat û mavkarên Kurd, li Sûriyê , ji zû û mêj ve li xwe miqyat û şiyar in , pircivîn û civat, li pir dever û navçan digerandin. Weke encam, bi navîna sibata 2006 an re, me pirojeya rêbaza wan dît. Ew piroje, bi nav û îmza komîta hevdemî ya kongira damezrandina yekîtiya mafkarên Kurd li Sûriyê,

**Xal û movirkên rêbazê yên bigehîn Ev bûn:**

- Navê rêkxirawê: Yekîtiya Mavkarên Kurd li Sûriyê.
- Navend û şaxên wê: Bajarê Helebê weke navend, hemû parêzgehên dî yên Kurd lê têne dîtin, cîgehê şaxan e.

**Armanc:**

- kar ji bo kesayetiya mirovê Kurd, di riya komele û dezgehan re were pejirandin.
- Bervedan ji ber mafên mirovê Kurd, azadiyên bingehîn û giştî li Sûriyê.
- Hawldan bona rêdaneke şaristanî û demokratîk dûrî nijadperestî, li gora belgeyên cîhanî û mafên mirovan...
- Kar ji bo zimanê Kurd weke zimanekî fermî li gel zimanê Erebî were pejirandin. ....
- Yekitî tê pişaftin bi biryara 2/3 ji endamên ku, li kongir beşdar dibin .
  *Em ji hêla xwe ve, dema ku, bi ragihandina vê yekîtiyê şah û pê serbilind in, serkewtin ji armanc û doza wan re hêvî dikin. Liben û hêviya pir dezgehên komelgehên şaristanî weke Endezyar, Nivîskar...Stranbêj î mozîkan û H.W.D.*

www.arsivakurdi.org

# Dilsozî

**Danheva : Zamdarê Zndî**

Rojekê pêximberê Mesîh ( Îsa), digel mirovekî bi rêde diçûn, sê nan pêre bûn. Piştî birek ji rê birîn, herdu birçî bûn. Îsa ji hevalê xwe digot :

- Niha em heryek nanekî bixwin û ya din jî, emê ji demeke din re bihêlin. Gava em birçî bûn, heryek ji me nîvî bixe.

Hevalê Îsa keyset ketê, bê wî ew nanê mayî jî xwer. Di pişt re, Îsa ji hevalê xwe pirsî: Ka wî nanî wîne. Hevalî wî gote: Berî vê bi demekê mirovekî biyan di vire derbasbû, min ew nan dayê.

Îsa ji wê gotinê vehesiya xwe nedî, lê, tu peyv nekirin. Bi hev re riya xwe girtin û çûn. Pêximber Îsa destê xwe avêt sê penç ax, bi ya Xweda, ew ax di destê wî de , bû zêr û ji hevalê xwe re got : Were em van zêran li hevekin. Ev pençek ji te re û yê din jî, ji wa kesê ew nan xweriye re û yê sisiyê jî, ji min re .

Hevêl jê re got: Min nanê dudiyê xweriye, ka wê pençê zêran bide min. Îsa jê re got: Zikekî sax û yekî çirûk, ji ber vê, hevaltiya han ji me re nabe; Divê her kes bi riya xwe de here.

Hevalê Îsa bi tenê birêket, li nîvê rê , sê çete rastî wî hatin, dest û lingên wî girêdan, zêrên wî jê birin.

Hersê çetan, bi rê de diçûn, li dervayî bajêr bi hev re digotin. Em birçîbûn, divê yek ji me xwerinê wîne. Yekî ji nav xwe dişînin bajêr. Çeteyê diçû bajêr, ramanên reş li serê wî sîwr dibin, bi xwe re dibêje: Ezê jehrê di xwerina wan kim, daku, ew bimrin, paya zêrên wan jî bibe ya min. Li pajêr, xwerina xwe dixwe û ji herdu hevalên xwe re xwerina wan tijê jehir dike.

Lê, herdu çeteyên din jî, bi hevre dibêjin. Gava ew ji bajêr vegere, emê wî bikujin û para wî ji xwe re bibin.

Hevalê wan ji bajêr xwerinê tîne, herdu li wî tên hev û wî dikujin û di piştre xwerina xwe dixwin . Piştî demeke ne dirêj, herdu çete jî dimrin

****************************

## Dumahîk: Mirov bi çi…

Belê, pir tişt li seranserî cîhanê hatine guhatin û bi dehan bûyer qewimîne. Lê, bawerî ew e ku, tiştê tek û bi tenê nayê guhartin, raman, nêrîn û helwestên pariya Be's e. Ew raman û nêrînên qewmecî hişk ku, ji bêtirî xwe tu kesên dî napejrînin û nabînin . Pirsgirêka serjimarê, 44 sal in berdewam e û hîn jî destlata Sûriyê bi soz û peyman ku, vê pirsgirêkê çareserbike!?. Berî çûna serok komarê Sûriyê li parêzgeha Hesekê, bêtirî carekê, berpirsiyarên dewletê sozên vegerandina nasnaman dane. Di wê çûna birêz Beşar El-Esed, bi soz û peyman, ku vegere Şamê, wê vê pirsê çareserbike!?. Piştî kongirê partiya Be's, li ser zimanê pir berpirsiyarên Be's û di hevpeyvînên xwe de bi qenalên telvezyonan re, digotin ku, çareserkirina pirsa kesên bênasname li ber deriya ne, an li benda imza serok e !?

. Gelo: ( Ev serjimara ne li zas li gor warê teknîkî), wê çend salên dî berdewam bike.

***Di dem ku, helmar di bin çapê de bû, gurzik nivîsar li kak Rizgar Kurdaxî giha me, bi navê: Kumancî...Dengê Bêkes û xebatkaran..Qêrî û lavêj.. Daritin.. gihane me***

www.arsivakurd.org

**Dumahîk : Kurd û ...**

xuyankirine .

***Ji mafên me yên netewî û rewa di çarçewa yekîtiya Sûriyê de bê par kirine û zimanê dê li me qedexe kirine . Bi ser de jî gelek pirojeyên awerte mîna (Kembera erebî û serjimar awerte ) di dermafê gelê me de pêkanîne û hepis û zandanên wan jî , ji xebatkarên Kurd vala nebûne . Em ji bîr nekin jî , rewaya berevaniya Tevgera Kurd li Sûriyê ya yekemîn , bi destxistina wan mafên netewî , rakirina zulm û zorê û gihandina gelê kurd li vî welatî ra azadiyê ye .***

Ji alîkî din ve jî , piştî ev guherînên demoqras ku , li rojhilata navîn çêdibin û şerê terorîzmê yê ku ji aliyê malbata navnetewî ve tê kirin wek : Roxandina rijîma Talban li Afgastanê , rijîma Sedam Husên li Îraqê û berzbûna doza Kurd li wir û qewtandina ordiyên Sûriyê ji Lubnanê û dozkirina serxwebûna wê ji bin lepê Sûriyê bi darê zorê piştî kuştina Refîq herîrî .

Li gel wê yekê hundirê Sûriyê ji hemî aliyan ve jî civakî , aborî , çandî , demoqrasî , dezgeh , rêzanî …..H.W.D , di bin siya rijîma be'is ya şoven (Partiya tekane) her diçe bi şûn ve û berve hilweşandinê dere .

Di vê rewşa kambax de , piştî dan û standinek kêm zêde di navbera Hêzên rikber ji rijîmê re di Sûriyê de û T.K li gel wan (Hevbend , Enî û paşê jî wîfaq) , gihîştin baweriyekê ku nema rijîma Sûriyê dikare guhartinan di hundir û siyaseta xwe ya derve de çêke . Ew her diçe dûzana xwe jî şaş dike û dihêle ku malbata navnetwî bi serokatiya Emerîka zorê bide ser û wek rijimek teror û ne aştiyane bi nav bike .

Ev wêneya heyî hîşt ku belgeya îlan dîmeşq ji aliyê rikberên Sûriyê ve çi kurd , çi Ereb ….. H.W.D derbiçe û jiyanê bibîne û ciyê balkêşiya hêz û xelkê Sûriyê be . Mirov dikare bibêje ku , ev blgeya, belgeyeke lihevkirinî û cara yekê bû li ser riyek rast di nav hêzên rikber di Sûriyê de ye , çi kurd , çi Ereb û çi Aşor . Vê hîşt mirov pê dilxwaş bibe û hêviya berdewamiyê , serkeftinê jê re hêvî bike .

Ji aliyê naveroka belgeyê ve , yê ku hîştî mirov pê şabibe . Guherînek demokras û dadmend ji rijîma Sûriyê re, û pejirandina geşkirinek doza kurd re , di Sûriyê de .

***(Di hundir wê de mafê cinsî , mafê fêrbûna zimanê dê , wekheviya mirovê kurd bi hemî hemwelatiyên din re û mafên din yên rêzanî , çand , civak , destorî ……..)***

Raste tiştên cî girtine ne li gor hêviya gel û tevgera kurd û bernameyên wan bûn . Lê me dilê xwe xweş dikir ji ber ku , weke me di destpêkê de gotibû ev belgeyek lihevkiriniye û ne li gor daxwaza hemî hêzên ku , li ser îmzekirine ye .

Lê, piştî ku , hin helwestên nerazîbûnê ji aliyê hin partiyên kurd ve ( Azadî-Yekîtî…..) hewldana berpirsyarên hin hêzên Ereb yên ku li ser belgeyê îmzekirine mîna Riyad El Turk , Hesen Ebdilezîm û Elî Sedir Eldîn Elbiyanonî (Ixwan Elmuslîmîn ) ku ji tiştî di belgeyê de di aliyê doza kurd de hatî vegerin û li gor xwe şirove bikin ku çareserkirina doza kurd li Sûriyê em di hemwelatiyê de têdighên . Daxuyana ku li vê dawiyê ji aliya komîta ragihandinê û belge şirovekirî û hin armanc û hêviyên hêzên Ereb yên netewperest lê zêde kirî xuya dike çiqas nûnertiya tevgera kurd di komîtê de jar û qelse , ne li heve û zû dişimite .Tu xêz sor li pêş wan tune ne û nêrîna T.kurd ne zelal e . Ji ber wê pêdivî îro berî sibe heye ku , T.K li hev bicive , nêrîna xwe bi kêmanî di dermafê çaresekirina doza Kurd de li Sûriyê zelal bike û şandeke li hev , bo vê komîtê vebjêre , da ku li dor me ne îro û ne jî sibe tu zîvrandin çênebin , em li gor hêviyên gelê xwe bin û tu cudatî di navbera tevgera me de jî çê nebe .

***Memê Alan***

www.arsivakurd.org

# Mirov bi çi tê girêdan!?

**Reşoyê Pîrê**

**Di** hemî olên banî , bîr û baweriyên zanyaran de, tiştê herî buha û girîng mirov e. Lewre jî, Kurd dibêjin : **Meriv bi zimanê xwe tê girêdan** ) . Yanê gotinên ji devê mirov têne der, ew peyman û biryer in. Ev pirs di jiyana gundiyan de, pir û pir cî girtiye. Lê, di jiyana siyasetê de, ne ewqas normal e

Piştî bûyerên 12ê Avdara 2004 na de, serok komarê Sûriyê, birêz El-esed, di hevpeyvina xwe bi qenala El-cezîrê re, ya di 1ê Gulana 2004 an de, hatibû weşandin û li roja dî,hemî rojnamên Sûriyê yên fermî dabûn belavkirin. Bersiva xwe li ser pirsa Kurd û pûyerên 12 ê Avdarê, weha anî zimên : ( ***Netewa Kurd li Sûriyê, beşekî bingehîn ji tevna civak û dîroka Sûriyê ye.... Tu destên derve di bûyerên 12 ê Avdarê de tunebûn... Pirsa Kurdên bênasname li ser riya çareserkirinê ye.***) .Di vê dawiyê de, telvezyona Tirkî, qenala Sikay-Niyoz, hevpeyvinekê bi serok komarê Sûriyê re , li dar dixe. Birêz El-esed, di bersiva xwe ya li ser pirsa Kurd, li Sûryê, weha tîne zimên ( ***Pirsa Kurd li Sûriyê pirseke Teqenî ye, bi serjimara 1962 an ve girêdayî ye, ew serjimar di warê teqenî de ne li saz bû, tu girêk siyasî nîn in. Ger girêkên syassî ji bo Kurdan hebûna jî, serjimara 1962 an çênedibû. Em jî vê pirsgirêka teqenî çareserdikin. Ji ber tu kelemên siyasî nî nin. Lê, ev pirsgirêka bi dîroka Sûriyê, ji serxwebûnê ve ,hê nehatî û di paşerojê de jî nayê guhartin)*** .

Gelo: Di navbera 12ê Avdara 2004 û dawiya 2005 an de, çi hate guhartin daku serok komarê Sûriyê, birêz Beşar El-esed, li xwe vegere û weha bêje !?. **D.R (10 )**




***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org